Welat 29
15 /05/ 2016
Çandî - Giştî - Serbixwe

# Dema FİŞEK nêzîkî her tiştî dibin



Wêne: Serdar Dari

Welat

Welat
Hejmar
29
15 /05/ 2016

# PEYVA WELAT

## Eger şerê çanda kurdî nehatiba kirin



Aras Yûsiv

Li tevahiya cîhanê serpêhatiyên welatan tekez kirine ku çi welatek dema li jêr serweriya xwe bijî û şer li dederdora wî raweste,îdî ew welat dest bi avakirina şaristaniya xwe dike,lewra dema ku em bixwazin çandeke kevnar bibînin em rastî dewletên xurt tên,ev yek nayê wê wateyê ku her çandeke xurt û pêşketî tenê ya ku xelkên wê dûrî şeran bûn,lê dewleta xurt di pirê caran de çandeke wê ya xurt hebû.

Em îro nikarin bêjin asta zimanê dewletên berê xwedî hêz û aniha teknelojî ne,di heman radeya dewletên ku ne ji mêj ve ava bûne,helbet çandeke welatên bindest heye,lê ew nakeve terazûya wan welatên ku ji sedên salan ve zimanê wan hatiye nivîsandin û bûye zimanê dewletê û ji ber vê yekê bi hezarên peyvên nû lê zêde bûne.

Teknelojî bi xwe jî roleke gelekî mezin di pêşketina zimanan de lîst,îro em dibînin dewletên ku xwedan teknelojî ne,ew in ên ku peyvên wan di nav hemû zimanan de belav bûne û hatine bikaranîn ta radeya ku ev peyv bûne cîhanî û îro kesek nema bi hewceyê tu jêre şîrov bike çi wateya gotinên wek: internet,kompiyûter,mobayil,an …e

Ziman jî mîna gul û daran e çiqas ku yek xwedî li wan der bikeve ew jî dê bêhn û berên xweş pêşkêş bikin,li vir de ka em bipirsin bê ka zimanê kurdî yê ku derfet jêre nehatiye danîn ta niha ji bilî zordariyê bibîne bê ka gihaye çi astê û gelo ew di asta zimanên pêşketî de ye an na ?
Ez guman dikim pirtûkxaneya kurdî ne tenê ya Kevin,lê ya îroyîn bi xwe jî di gelek pirsgirêkan re derbas dibe, hinek ji wan girêdayî rêziman in û yên din girêdayî nebûna zimanekî ku li her deverî ji kurdistanê were fêmkirin,ev yek ji bilî êşa zaravên zimanê kurdî yên ku gelek milet jî êşa wê dîtin,lê wan dikarîbû zimanekî xweyî stander peyda bikin dema dewletek ava bû û ev hemû zarav di hundirê wê de bûn..
Belkî em ê ji rastiyê ne dûr bin dema em bêjin ku temenê rasteqîn ji rojnamegeriya kurdî bi zimanê kurdî (kurmancî) ji dema çapkirina rojnameya Kurdisatn dest pê dike,ev yek diyar dike ku zimanê Kurdî yê ragihandin,tenê sed û çend sal in ji ber ji piştî wê demê,îdê derfet vebû ku kultur,dîrok,berhem û çanda kurdî were nivîsandin û pirtûkxaneyeke kûrdî îdî were avakirin.

Helbet dema rojnameya Kurdistan hate çapkirin,ew ne li kurdistanê bû,lê li Misrê bû û ji piştî wê demê bi xwe jî ta niha hatiye çewisandin.

Her peyveke kurdî îro ku çi kes binivîsîne,pirtûkxaneya kurdî dewlemend dike,lewra her yek ji me berpirsyar e ku peyveke kurdî zindî bihêle ta ku em karibin wefadar ji kesên bi hezarên salan ev ziman ji me re zindî hiştine,bin.

Eger şerê çanda kurdî nehatiba kirin helbet îro em ê xwedî pirtûkxaneyeke kurdî ya mezintir bana,belkî îro ew sînorên ku dihatin danîn da ku ev çand û ziman bimir e,ew bi xwe mirin,lewra ev dem û hemî demên tên dê demên xweş bin ku ev ziman baştir roniyê bibîne.

Kovara WELAT
Çandî- Giştî- Mehane

Welat
Çandî- Giştî- Mehane

Sernivîser:
Aras Yûsiv

Desteya rêvebir:
Mihemed Zekî Mihemed
Hekîm Ehmed

Dizayner:
Hesen Berzencî

**Têbînî**: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediyê xwe ne û nivîskar berpirsê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne

**ji bo têkiliyê:**
welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

تبنّى ثورة
adopt a revolution



# Orkêş ..
## Vedenga Vedîtinê

**Izedîn Salih**

Ji berbanga dîroka şaristaniya Sûryê ve,zanyar û lêkolînerên arkolojîk li herêmên Sûryê,Îraqê,û perçeyek ji Tirkiyê jî li Bajarê Orkêşê yê ku di Pirtûka pakîza «Incîlê» de hatiye diyar kirin digerin,ta bi sala 1932an ku lêkolînerê arkolojîk Makis Malon û hevjîna xwe,nivîskara Îtalî ya navdar Agata Kirêstî tev girûpên xwe yê arkolojîk hatin deştên girava Sûryê da ku li bajarê Orkêşê û şaristaniya wê bigerin,Makis Malon û girûpên xwe yên arkolojîk ji herêma Xabûrê dest bi lêgerîn û vedîtinê kirin,li derdora Xabûrê tev vekolîn kirin,lê bê ku tu sûdeyê wergirin,piştî çend demsalan ji vekolînkirinê ew ji lêgerînê û vedîtinê bê hêvî man,lewra wan ragihand ku hebûna Orkêşê tune ye,û ew bi tenê efsaneyeke di sawêrdanka Gelên Hûriyan de yên ku li ser banê giran li deştên giravê dijiyan hatibû çandin.

Roj li pey hev derbas bûn,ta ku rojekê ji rojan zanyar û lêkolînerê arkolojîk Corciyo Bocêlatî û hevjîna xwe çav li du şeran ku ji bonze hatine çêkirin di mozexaneyên «Mîtropolîtan û Lover» li Parîsê ketin,ku li ser wan bi zimanê Hûriyan hatiye nivîsandin: «ev ji bajarê Amûdê di sala 1948an de hatine kirîn»,ku ew pût ji nîşanên şahê Orkêşê bûn,ji wir ve raman di serê Bocêlatî de geriyan û lêgerîna li Orkêşê ji nû ve dest pê kir,ku Bocêlatî û hevjîna xwe di sala 1982an de hatin bo bajarê Amûdê û dest bi vekolîneke rasteqînî li herêmê û girên hawêrdora wê kirin,û ji xwe re Girê Mozan yê ku 3 kîlo mêtran nêzî Amûdê ye ji bo vekolînê hilbijartin,hêjayî gotinê yî ku Girê Mozan li Amûdê ,li gorî Rûber û bilindbûna xwe Mezintirîn Gire.

Di Payiza sala 1948an de girûpê Bocêlatî yê arkolojîk û şandeke arkolojîk ji zanîngehên Kalîforniya û Lûs Ancilos dest bi lêgerîn û vekolînê li Girê Mozan kirin,û piştî heşt demsalan ji vekolînê û karê kedane wekû kelmoza mêşan ser demek dirêj ve ji xebat,analîz,û berhevdanê,ew gihiştin rasteqîniyê ku Girê Mozan bi xwe Orkêşa Kevine,lê tev vê yekê jî lêkolîner û zanyarê arkolojîk Bocêlatî dît ku ew war wêneyek yêkalî rasteraste ji navenda Hirînî ya kevnare,û tekez kir ku Girê Mozan Şûnwarê Şaristaniyên Sûryê yê kevnarin,girûpê Bocêlatî lêgerîn berdewam kirin û wan li paş dergehê navendî pûtê şêrekî kevirî ku vedigere nîvê sedsala sisiyan û morek ji late li ser hebû,herwiha morek di embara şah de ku ser wê nîgarê yek ji şahên Hûriyan yê ku navê wî Topikiş bû û li tenişta wî hevjîna wî ya navê wê Akilîtom bû dîtin,ku temenê embarê vedigere 23002500-sal b.z.

Vekolîn berdewam dibûn,û cihê koşeka şah jî hat nîşan dan,herwiha di demek kin de zêdetir ji 600 depên destnivser hatin vedîtin,çîroka Orkêşê bi dawî nebû,ku hîn jî demsal bi demsal karên lêgerîn û vekolînê li wê deverê berdewam dibin,bi armanca ku bêhtir zanistî û venerîn li ser wê şaristaniya ku dîroka Gelên bakûrê Sûryê diyar dike bê ronî kirin.

# Duzimanî

**Hekîm Ehmed**



Bêguman, zewac damezirandina saziyeke hevbeş e,saziya yekeme di civakê de,damezrênerên vê saziyê jî du alî ne,jin û mêr,ewên ku dibe di gelek tiştan de ne weke hev bin,lê jiyana wan hevbeş e,herwiha zarok berhema vê jiyana hevbeş û mezintirîn stûbariyên wê ne,ku hinek ji sincên bav,hinek ji liv û taybetmendiyên dê kesayetiya wan zarokan ava dike.

Ziman,yek ji wan aliyên ku zarok bêhtir ji dê û bavê xwe digirin,tevî ku rola malbata mezin,heval,mamoste û tevaya civakê jî bandoreke mezin li zimanê mirovan dike. Wilo zarok dengên dê û bav dike piştî demekê ji wan fêm dike ka çi dibêjin,ta ku digihe qonaxa ku tê de,dikare gotinan hêdî hêdî bilêv bike û baxive.

Li gor pisporan zarok di temenê sal û nîvê ta 3ê salan,hînî axaftinê dibe,tevî ku hinek zarok berî ku sala yekê bi dawî bikin,dest bi gotinan dikin,lê da ku zarok di dema xwe de dest bi axaftinê bike,divê mînakên durist li pêş xwe bibîne,ji bo ew jî weke wan kesên mezin dev û zimanê xwe bilivîne û cihê derxistina tîpan nas bike.

Lê dema dê û bav,herdu kesên herî nêzîk û bi bandor li ser zarokê,ne weke hev daxivin,ango du ziman an du zarav di malbatê de hebin,wê çawa zarok vê diyardeyê bibersivîne? Herdu jî ne şaş daxivin,lê her yek ji wan bi awayekî berê derbirînên xwe dide zarokê.

Helbet,ev mijar li herêmên ku ziman û zarav tê de rengereng in dibe diyardeyek,lê zarok jî ne weke hev vê wêneyê zelal dikin,ji ber ku di dema em dibînin ku hinek pirsgirêkên zimanî li ba beşekî ji zarokên duziman derdikevin,em dibînin ku zarokine din herdu zimanan bi serbestî bikar tînin,sedema vê cudabûnê tê,ji rastiya ku zarok di karînên xwe de cuda ne,pirsgirêkên wan jî ne ji ber heman sedem û mercan derdikevin.




Beşê yekê ji zarokên duziman xuya dike ku axaftina wî li cihina radiweste,hevokên wî ne herikbar in û gelek caran ew ji derbirînên xwe ne bawer e,herwiha carina şaşiyên rêzimanî jî li ba wan xuya dikin,ta asta ku belkî ew di hest û ramanên xwe de herdu zimanan dûrî xwe bibînin. Di heman demê de,beşê diwem ji zarokên duziman dikarin di axaftina xwe de serkeftî bin û piraniya wan di fêrbûna zimanekî çaran û pêncan de jî serkeftî ne.

Ezmûnên pisporan di vî warî de,ji me re dibêjin ku di rewşa duzimaniya malbatê de,çend awayên giring hene ku hînbûna zarokê hesan û durist dikin, w jî ev in:

1- Li destpêkê zimanek tenê hebe,bi taybetî di qonaxa hestyar de,temenê berî axaftinê (ta temenê sal û nîvê),piştî vî temenî em dikarin bi zimanê diwem jî bi zarokê re baxivin,tiştê balkêş li vir ku hînbûna mezinan ji zimanekê re,li ser bingeha zimanekê din tê,lê eger ew kes nizanibe tu zimanan û du zimanan bi hev re werbigire,bêguman wê hinek tevlêhevî çêbibe.

2- Divê herdu ziman ne ji jêderekê bin,weke ku dê

bi zimanê xwe,bav jî weke zimanê xwe bi kur an keça xwe re danûstandinê bikin,wê zarok jî fêr bibe ku li her yekî bi zimanê axaftina wî lê vegerîne,ev mînak bi mezinan re jî derbas dibe,dema hevalên wan ên civatekê xwedî zimanine cuda bin.

3- A baş ku bikaranîna her zimanekî di dem û cihine cuda de be,weke dema xwarinê zimanek be û dema lîstikê zimanê din be,yan li malê zimanek be û dema serdana merivan zimanê din be,li vir diyar e ku zimanê ap û xalan ji hev cuda ye,dibe ev jî alîkar be.

Bi rastî,eger em li rewşa cîhanê ya îroyîn binerin,emê nas bikin ku zimanek bi tenê ne bese ji bo mirov zanyar an rewşenbîrekî çalak be,ev dihêle ku malbata duziman,wê taybetmendiya xwe bixe sûde ji zarokên xwe re,ji ber encamên erênî yên zanîna bêhtirî zimanekî gelek in,weke jîrbûna di xwendina akadîmî de,lîstina gelek rol û pêkanîna gelek erkan di heman demê de,herwiha bijîşkên di vî warî de xebitîne dibêjin ku zanîna du zimanan,mirov ji bêhişiya temenê mezin (zhaymerê) diparêze yan jî wê nexweşiyê dereng dihêle,ji ber axaftina bi du zimanan mêjî bi hêz û çalak dihêle.

Bi kurtî, her zimanek çandek e,gurzek derbirîn û hestên cuda ne,duzimanî jî rewşek e normal û sûdar e,tenê em hay ji hin têgeh û bingehên perwerdekariyê hebin.






# Gundê Babasî

Wergerandin: **Elend Mihemed**

Ji rûpela facebookê ya Çar çira



Ji devê Eliyê Miradê Mişko yê ku di sala 1941an di li gundê Dêrûna Axê ji dayik bûye, û ji sala 1945an ve li gundê babasiyê cîwar bûye,hatiye giritin..

Babasî ew navê gund ê rasteqîn û resene û hemî şêniyîn herêmê bikartînin,paşê ji hêla rêjîma sûriyê ve kete ber siyaseta Erbîkirinê, bi Sîna›i hate bi nav kirin.

Ev gundê bi xurista xwe ye qeşeng û spehî,sînorbire di navbera herêma (Aliyan) û herêma (Cerehê)de,ew ji aliyê rojava ve gundê dawî ye ji herêma (Aliyan) û ji bakur ve sînordarê gundê (Şêtika) û sînorê Turkiyê ye,ji başûr ve gundê (Maşoqa)e, rojhilatî wî gundê (Elî Bedran) e.

Ji hêla kargêriyê ve û Li gorî dabeşkirina hikumeta Sûryê bi navça (qeza) Çilaxa ve girêdayî ye,lê li gor dabeşkirina kantona Cizîrê bi navça (qeza) Tirbespiyê ve hatiye girêdan,Babasî dora (25)km an ji Çilaxa û dora (21)ê ji Tirbespiyê dûr e.

Gundê (Babasî) di navbera sala ( 19301935-)an de hatiye avkirin û ji cîwarbûnê re amade bûye.

Berê rûbera xaka çandiniyê (4000) donim bû,Birinc,Pembû,Darên bergir û deştane (Spîndar , Sindiyan....) û hemî cureyên şînkayî û çandinyên bejî,lê dihatin çandin,lê bi sedma kêmbûna baranê çandina wan cureyên şînkayî rawestiye,û ji wê rûbera çandiniyê tenê (800) donim mane ji ber ku gunda kete ber pirojeya xeta dehan ya ku (Zinara Erebî) ya nijadperest û kirêt de,ew pirojeya rikgîr û kotek ku rijêma Sûriyê di herêma Kurdî de cî bi cîkir û bi wê bihaneyê xakên wan ji destê wan derxistin û ji (800) donimê ku mayî (400) donim li malbata (Kini›o) û (400) li malbta Hecî hesen hate belavkirin.

Lê belê, nîvê arziya gund a ku li malbata Kini›o vedgeriya,Hisênê Osê kirî û nîvê dî yê Elî Zilfo û malbata Haco bû piştî demekê malbata Haco dest danîne ser û (80%) ji berhemê çandiniyê dibirin weke bacê bû (Hasil) dihate binavkirin,niha gundî bi keda destê xwe û xwedîkirna sewal û curêyin din ji ajelan jiyane xwe dibûrînin.

Berî ku şoreşa Sûryê di sala 2011 an de destpê bike hejmara xaniyên ku jiyan di wan de dibû (50) î xanî û (600) kesî bûn,lê niha jimara xaniyên ku jiyan di wan de berdewame (30)î xanî û (150) kesiye,piraniya jimara ku mayî, jin, zarok û kalmêr in ango ji xort û ciwanên berhemdar valaye.

Lê yên mayî arziyên xwe diparêzin û bi xaka bav û kalan ve girêdayîne,û puxteya kocberiya ku çêbûyî,bêpariya şêniyan ji mafê welatînî, xakê ye, û stem, belengazî û leşkerî jî di vê rewşê de xwedî bandor e.

Hêjayî gotinê ye ku piraniya şêniyên gund ji hoza (Saliha) ne,tevî ku hin malên ji hoza (Dil memka û seyida) jî ne,gundî hemî bi ola xwe Misilman in.

Hin xizmetguzariyên sivik li gund peyda dibin,mîna Bîreke Tirwazî,dibstenke qunaxa sertayî û rêyrke qîrkirî di ber gund re diçe.

Ji bilî xurşta gund a sur û spehî gelek sernavên din hene ku Babasî kirine gundekî awarte ye,yek ji wan Ciwa Hezexe,ku xirstyanên (Filehên) Hezexê kola bûn, ji Babasiyê destpêdike û bi aliyê gundê Maşoqê de diçe, wisa jî kaniyeke lê heye û bi (Kaniya borangeh) tê bi navkirin,hewheha gundekî pîroze ji ber ku gora (ziyaret) a Şêxekî ku bi navê (Şêx Miheme) navdare di gund deye.

Tevî spehîtî û sernavên Babsiyê jî, xwedî dîrokeke berçave di xebat û têkoşîne de,serê mirov ji ber bilinde, ku ji kevn de navendeke netwayetiyê bû,ji ber vê xebat û rûmet bi (Gelala) di nav gundên herêmê de di hate naskirin, ango Babasî ya mêrxas û wêrek gundê pêşîn bû ku bi hawara gundê (Dêrûna Qulnga) ve çû,dem ku hêzên turkiyê êrîşî wî gundî kirin,di encama wî şerî de ku bi (Şerê Dêrûna Qulinga) navda r e,efserekî Turk hate kuştin.

Tevî nîrên zor û dijwar ku ev herêma Kurdî tê re derbas dibû,kongirê diwem yê yekemîn pariya Kurdî (Partiya Dîmqrat a Kurdistnî) di sala 1977 an de li Babasiyê hate lidarxistin.

Hêjayê gotinê ku apê Ehmed Yasîn ji gundiyên herî kevnar û temen dirêrje, li ser avkirina vî gundê mêraxas û pêşewe bîner e .







والأدوية الأكثر فقداناً في السوق المحلية هي الأدوية الخاصة بعلاج الأورام الخبيثة (السرطانات).

كما وارتفعت أسعار الأدوية بشكل عام منذ بدء الأزمة السورية بنسبة كبيرة قد تتجاوز نسبة الـ ١٠٠٪ , وقد تصل هذه النسبة الى ١٥٠٪ لبعض الأدوية المفقودة.

وأيضاً ارتفعت معاينة الأطباء بنسبة ١٠٠٪, اذ كانت المعاينة قبل بدء الأزمة تساوي ٧٥٠ ليرة سورية لترتفع في زمن الأزمة إلى 1500 ليرة سورية.

**هجرة الأطباء والكوادر الطبية :**

منذ بداية النزاع في سوريا, تشهد المدينة نزيفاً مستمراً في عدد الأطباء والممرضين والكوادر الطبية المختصة من عاملين وفنيين لأسباب متعددة, منها تردّي الأوضاع الأمنية ولاسيّما ظاهرة خطف الأطباء من قبل المجموعات المسلحة, وأيضاً سوء الظروف المعيشية وغلاء الأسعار وتدني مستوى الأجور, والبعض منهم شبَّان هاجروا بسبب الخوف من السَّوق للتجنيد الاجباري أو الاحتياطي من قبل جيش النظام, أو واجب الدفاع الذاتي المفروض من قبل الإدارة الذاتية الديمقراطية.



ونتيجة لذلك أغلقت العديد من العيادات الطبية في المدينة بنسبة تصل الى ٢٥٪ من أصل العيادات التي كانت تعمل قبل بدء الأزمة, بسبب هجرة الأطباء وظروف الحرب, وأغلب الأطباء المهاجرين ينتمون الى المكونين الكردي والمسيحي في المدينة.

**دور المنظمات الخيرية والصحية التطوعية :**

لم تستطع هذه المنظمات تأمين احتياجات الناس المتزايدة, باستثناء بعض الحالات المعدودة التي قامت فيها بعض المنظمات الخيرية بتقديم مساعدات نقدية للمرضى بغرض إجراء عمليات جراحية ذات تكاليف باهظة, وفي بعض الأحيان تقوم منظمات خيرية بتقديم الأدوية لعدد من المرضى ولكن بكميات ضئيلة جداً وتشمل أعداد قليلة من المواطنين.

فيما قامت بعض المنظمات الصحية التطوعية بدور هام في مجال توعية السكان المحليين للوقاية من الأمراض المعدية والأوبئة , ولاسيما داء اللايشمانيا وانفلونزا الخنازير.

**مخاوف السكان الصحية :**

مع اقتراب فصل الصيف هنالك مخاوف كبيرة حالياً لدى السكان من داء اللايشمانيا, بسبب انتشار ذبابة الرمل المسببة للداء, وعدم توفر المبيدات الحشرية اللازمة للقضاء على هذه الذبابة, ولكن العلاج متوفر وكذلك اللقاحات في حال حصول الإصابة.

وكذلك هنالك مخاوف من انتشار وباء (التهاب الكبد الإنتاني A ) الذي يصيب الأطفال, وينتقل عن طريق العدوى من خلال استعمال الأدوات المشتركة في الروضات والمدارس, لذا ينصح بتخصيص أدوات وقرطاسية خاصة بكل طفل لتجنب انتقال الفايروس بالعدوى, وأيضاً العلاج متوفر في المدينة.

**سالار صالح**

**الحسكة**

الواقع الصحي في الحسكة

9

# الواقع الصحي في الحسكة

تأثر القطاع الصحي في الحسكة بالأزمة السورية مثله مثل باقي القطاعات الخدمية في سوريا، وشهدت المدينة تراجعاً مخيفاً في عدد الأطباء والكوادر الطبية المختصة نتيجة الصراع العسكري في البلاد وغياب الأمن والاستقرار, كذلك فُقدت أنواع كثيرة من الأدوية ولم يستطع الدواء البديل أن يفي بالغرض نظراً لانخفاض الجودة, وعلى الجانب الآخر شهدت المدينة إغلاق العديد من العيادات الطبية وهجرة الأطباء المختصين, الأمر الذي انعكس سلباً على مستوى الخدمات الطبية في المدينة.

**عدد المستشفيات الموجودة في الخدمة:**

كانت المدينة تحوي /٦/ مستشفيات, استمرت /٥/ منها في تقديم خدماتها في الوقت الذي توقف فيه السادس وخرج عن الخدمة, والمستشفيات التي لاتزال في الخدمة هي:

* مشفى الحسكة الوطني (قطاع عام), ويعاني المشفى المذكور من عدم توفر الأجهزة الطبية ونقص في عدد الأطباء والكوادر الطبية المختصة.

* مشفى الحكمة ( قطاع خاص), ويحتوي على غرفة للعناية المركزة بعدة أسرّة.

* مشفى عصام بغدي (قطاع خاص).

* مشفى شابو (قطاع خاص).

*مشفى دار الشفاء (قطاع خاص).

*مشفى الجزيرة (قطاع خاص) والمعروف بمشفى شويش, خرج عن الخدمة نتيجة الأزمة ونقص عدد الأطباء و الكوادر.




**الأمراض المستعصية على العلاج :**

هناك عدّة أمراض منتشرة في مدينة الحسكة لا يتوفر لها علاج مثل أمراض المناعة الذاتية (داء الذئب الحمامية ) وأمراض الدم والأورام الخبيثة (السرطان) إضافة إلى التهاب المرارة بسبب الحصيات والذي يتطلب جهاز تنظير خاص غير متوفر.

والحل البديل لعلاج هذه الأمراض هو السفر إما إلى العاصمة دمشق, أو السفر الى خارج البلاد كإقليم كوردستان العراق أو تركيا, والخيارَين يفرضان صعوبات جمة على المرضى و ذويهم من ناحية تكاليف العلاج الباهظة وارتفاع أجور السفر بالطائرة الى دمشق, وصعوبة العبور الى خارج البلاد بسبب إغلاق المعابر الحدودية واللجوء الى الطرق غير الشرعية للعبور والتعرض لاستغلال المهربين والسماسرة.

**الأدوية :**


الأدوية غير متوفرة بشكل دائم في المدينة, ويحدث انقطاع جزئي بسبب صعوبة وصول الشحن بشكل متواتر نتيجة حالة الحرب والاشتباكات في مناطق العبور, لذا يتم الاعتماد بشكل أساسي على الشحن بالطائرات وهي الطريقة الوحيدة الآمنة لوصول الأدوية الى المحافظة بشكل عام.



# Pakrewanên Qamişlo.

Şiyar silêman.

Xaka Qamişlo,dilê xwe veke
Rabe pêşwazya,mêvanên xwe ke
Qurban Qamişlo,çavê te´l wan be
Em xweş bawer in,tê bi wan şa be
Ji evîna te,hatine ba te
Ev qet ne şîn e,ne bobelat e
Xortên Qamişlo,îro şehîd in
Îro tu şêxî,em tev mirîd in
Ketne sur û hal, ji evîna te
Em tev goriyên,serberziya te
Dilê xwe veke,bi dilovanî
Serê xwe hilde,ezmanê banî
Dil nesojîne,can ne êşîne
Dilê gelê te,îro birîn e
Tu dayka me yî,dilê me xweş ke
Îro newroze,riwê xwe geşke
Malnemîratê,ev ne mirî ne
Çima tu digrî,ma tu nabîne
Xwîna ji wan tê,tev misk û bîn e
Mifa û dermanê,canê birîn e
Ev çende sal in,em dilbirîn in
Çav bendewarên,cergên bixwîn in
Ev roj pîroz e,cejn û newroz e
Ev qet ne şîn e,xebat û doz e
Qamişloka min,ma tu nizanî?
Qet qezenc nîne,bêyî ziyanî
Eger tu zanî,çima tu digrî?
Kaniya hêsran,divê tu bigrî
Ev giriyê min,ne li ser wan e
Dilê min li ser,dayikên wan e
Ez xweş dizanim,ew serbilind in
Ew pakrewan in,egîd û merd in
Ez pê dizanim,dema ku can dan
Dilxweş ruha bûn,ji kul û derdan
Lê dayikên wan, tev dilfikar in
Hêsirên xwînê,çavên wan xwarin
Çi sûcê wan bû,gelo çi kirbûn?...
Sûcê way mezin,li vê cîhanê,tenê ew kurd bûn
Heŝtên lehengan,di nav dilên wan,hîna nemir bûn




# Rojekê ji rojan.

Ronza Hesen.

Kulîlka sergêjer şiyar bû
Ya ku tevan sergêjiyên wê dinasîn
Lê,wê rojê bi tenahiyê hest dibû
Bi sermayê hest dibû...
Ew bi raza vî hestî agahdar bû
Ew hewcedar e ku hinek ji dilopên dilzîz bidinê
Hinek pelên wê bi hingêvin
Wê bi ewleiyê hest bike
Çûkek hebû,her roj li dora wê dizîvrî
Rewşa wî di şopand
Bi dirêjahiya rojan
Bê ku bizan e
Çûka dilê wê digirit
Ta roja ku têgihişt ku
Ketiye dava wî
Yê ku dilovaniya wê têr bike
Dît....
Yê ku wê di çîrokên xeyal û evîniyê de
Bin av bike
Gelo rewş dê wiha berdewam be!??
Car bi car
Bahozek radibû,ezman girav dikir....
Lê hin bagir mirov nikare
Rawestîn e
Roj li pey rojê...kulîk stûxwar dibû..nema dikarî xwe ragir e
Qels û biçûk bû
Toza dûriyê ew westand
Barana cudahiyê ew westand
Çima ev westan
Çima ev tîbûn
Dilopeke hêviyê nema,ku pê bijî
Mirina wê bê guman e
Hêzên wê bi dawî bûn
Tu hîn çi dixwazî
Giyanê wê bimijî..tiştê bi tenê jê re maye!?
Ew jî ji te re... weke tu dixwazî...
Lê,hêviyê ji dikim
Bihêla hilma dawî dûrî te bikşînî.





# Welatê dijwar

Umer Ehmed



Welat gotineke bikar tê,gelo em dizanin ev gotin tê çi wateyê,ev gotina ku hemî tişt li ser milên xwe hilgirtiye, koçberî,penaberî,pakrewanî û hemî tiştên ku bi milet ve girêdayî ne,ez pirsdikim,gelo welat ji bo we tê çi wateyê?.
Xaknîgarî,ax,av û ezman.....
Di van rojan de em bêjeya welat gelekî dibhîzin çi ji alavên ragihandinê û çi ji kolan û miletê xwe,ji bo vê gotinê me ji gelek kesan pirsa wateya welat kir û çi wateyê di mejiyê wan de cîgirtiye?.
şemsedîn feqe wiha dibêje: Welat her tiştekî buha ye,welat rûmeta mirovan û mirovatiyê ye,welat ji her tiştî şêrîntir e,çi kesê bê welat be ew weke bê jiyan be.
Welat tu carî bi tu tiştî re nayê nirxandin.
Ev gotin bi kurtasî ji vî welatî bû . lê welatiyekî din dema ku min ji pirskir welat çî ye? çavên wî bû kaniya hêsiran û nedizanibû çi bibêje ev welatî mihemed reşîd bû û wiha ji kovara welat re got: Welat dayîke,lê di vê dema niha de welatê me bû ye zîndaneke tarî,ev zindan çê bûye,ji ber lihevnekirina partiyên me yên siyasî,ji ber ku van partiyan gelek nakokî derbasî welatê me kirin e,ev nakokiya wan jî ji ber ezeziya wan e,lê mixabin ez nizanim çi bêjim.
Nêrînên gel li ser welat wiha bûn,ez dikarim pirsbikim?.
Welat bûye pirsgirêk,lê pirsgirêkek di welatê me de heye?
Ez persiva vê pirsê ji we re dihêlim.



# Jiyana Zarokan Di Şoreşa Sûryê de

Hisên Al Sîno

Ji destpêka şoreşa Sûriyê ve,zarokên Sûryê bûne parçeyekî bingehîn yê şerbi rêya temaşekirina nûçeyên Şoreşê ku kete sala xwe ya şeşan de, ji aliyekî din ve,ezmûnên wan bi hemû cureyên çekan re,ta asta ku ew navê balafir û tankan dizanin,herweha sloganên li kolanên Sûryê derbasî jiyana zarokan ya bêguneh bûne.
Zarok ,îdî li vî welatî, jiyana zaroktiya xwe jibîr kirine,xwe di serê xwepêşandanan de dîtin û hinek ji wan di rûniştin û civatên hevrêzên ciwanan de beşdar dibûn. Ew zarokê ku şer dikir ji bo rakirina qedexeyan ji ser ger û liva wî,xema wî ya sereke ku kengî roja Înê bê, ji bo ku dakeve kolanê. Malbatên van zarokan xwe nedikirin asteng li pêşiya xwestekên wan,lê piştguhkirina rewşa wan berdewam bû ku li ber televizyonê diman,ranediketin û li nûçe û dîmenên xwîn û tirsê temaşe dikirin,wê piştguhkirinê roleke gelekî xerab lîst û encamine nebaş di jiyana zarokan de derxistin,tevî wê,zarok li Sûryê bi giştî û zarokên kurd bi taybetî, jiyana xwe normal dibînin,xwe li hemû bajarên Sûryê didîtin kesên herî giranbuha di şoreşê de.
Bêguman,diyardeya ku zarok ji zarokatiya xwe dûr ketine,bobelateke mezin e,zarokatiya xwe ji bîr kirin û bi demê re,dibe bandoreke neyînî li ser jiyan û kesayetiyên wan bike,ev in rewşên ku ji bo destêwerdana jiyana zarokan bûne sedem,carina bi mebesta ku rêya rast bidin ber wan,lê bila kesên baweriyê bi vê ramanê tînin,bînin bîra xwe û vegerin zaroktiya xwe,da ku dûrî jiyana şer,rastiya zaroktiyê bibînin.
Tevî ku derengî cihê xemsariyê ye,lê belê hin rêxistinan,dest bi çalakiyên ji bo zarokan kirin,bi taybetî li bajarê Dirbêsiyê daxvim,rêxistinên guhdanê bi zarokan ava bûn,weke rêxistina “Roka zaroktiya - Şems” ya guhdana zaroktiyê,wê rêxistinê bi lez roja 31 /3/2016 an,çalakiya xwe ya yekemîn lidarxist,şahiyeke xweş li navenda Encumana herêmî ya bajarê Dirbêsiyê (Encumana pakerwan Ciwan Qutna) çêbû. Wê şahiyê,bi rêya reqs û stranên zarokan,ew hinekî vegerandin zaroktiya wan,li dawiyê rêxistina “Şems” diyarî ji bo zarokan belav kirin û bi kêfxweşiyeke mezin roja xwe derbas kirin,rêxistina “Şems” soz da zarokan ku wê ji bo wan,bi gelek çalakiyan rabe,çimkî “Şems” ji bo wan hatiye avakirin.
Di dawiyê de,pêdiviya zarokan bi gelek çalakiyên wiha heye,çi ji aliyê vê rêxistinê be yan jî hineke din bin,da ku zarok bikaribin zaroktiyê bijîn û ji nûçeyan,tirs, xwîn û guleyan dûr bikevin. ■

# Rewşa avakirinê li Girkê Legê

Faxir Ebdela

Girkê Legê weke navendeke bazirganiyê hatiye naskirin,ji ber giringiya cîgehê wê yê xaknîgarî,ji aliyêkî ve nêzîkî bajarê Rimêlan e,ji aliyê din ve dikevê nevbera sê herêmên berfireh de,Til Koçer,herêma Aliya û Koçeran û gudewarê wan.
Ji loma ji sala 2001ê ve liv û bizava avakirinê li Girkê Legê destpêkir,tevî ku hindek astengî û alozî ji aliyê rijêmê ve hebûn.
Di havîna sala 2011an de,piraniya şêniyên Girkê Legê dest bi avakirinê kirin,û gavne baş di çarçewa avakirinê de avêtin,hejmara avhiyan jî pir bû,û rê li ber kirîn û firotina avahî û xanûberan pir bû,nemze piştî ku gelek şêniyên herêm yên ku li Şama paytext cîwar bûbûn vegeriyan û paşê li herêma Kurdistanê hêwirîn,lê ji ber pêla koçberiyê û kêmbûna karkeran,hêdî hêdî liva avakirinê kêmbû.
Tevî van sedeman jî hîn avakirin li Girkê Legê ji ya hin bajarên din baştir e,ew jî vedger e ku gelek biyanî lê cîwar bûne,û hîn jî ta rêjeyeke bilind ev bajar aram e.
Derbarî vê mijarê me rapirsînek bi hin welatiyên Girkê Legê yên ku bi vê mijarê mijûl dibin,sazkir.
Elawan Umer di çarçewa avakirin û xanûberan de di xebit e,ji kovara Welat re axivî: Birastî ev demeke başe ku avakirin li Girkê Legê kêm bûye,sedemên wê jî buhabûna nirxê pêdiviyên avkirinê û kêmbûna kirîn û firotinê,ya din jî penabirî ye,ku bandoreke neyînî li herêmê bi tevayî kiriye.
Tariq Elî xwdiyê Tirêksê ye,ji Welat re diyar kir: Ji havîna par ve karê me hin bi hin kêm bû,ev jî vedgere daktina nirxê lîreya Sûrî li hemberî dolar,kêmbûna kirîn û firotina xaniyan,ji ber ku nirxên wan pir buha bûye.
Textor Yaqûb xwediyê kargeha Mermer û kevran e,bi dilekî xemgîn ji kovara Welat re axivî: Hêviyên xelkê nemane,rewş ne zelal û diyar e,buhabûna nirxê alavên avkirinê û xaniyan,divê koçberî û valakirina herêmê jî neyê jibîrkirin.
Salih hostayê siwarkirina kevir û sîramîka ye ji Welat re got: Ev demeke baş e,karê me qels bûye,ev jî vedgere buhabûna nirxê dolar bi şêweyekî pir bilind û tunebûna pêdiviyên avkirina xaniyan,her weha sînor bi tevayî girtgîn e.
Ehmed I'smayîl (Seyda) yek ji xwediyên nexweşxaneya can e,û di avkirin û kirînfirotina xanûberan de di xebite ji kovara Welat re diyar kir: Tevî rewşa dijwar û buhabûna pêdiviyên avakirin,em maldarên herêmê dê di avakirina bajarên xwe de berdewam bin,û herêmên me ber bi geşepêdanê de herin û derfetên kar ji miletê me re vebin.
Divê hêviyên bi hatina rojên xweş û azad neyên birîn,ji ber ku bêhîvîtî mirin e. ■





# Rêjîm mûçeyên karmendan radiwestîne.

**Beyar Xalid**

Tevî rewşa abûrî ya dijwar ku welatiyên Sûryayê bi tevayî tê de derbs dibin,hîna jî rêjîm bi kiryarên xwe yên xirab,dixwaze benê xwe li derdora stûyê wan zeftir girê bide,bi taybetî karmendên dezgehên dewletê yên ku bi riya karê xwe hîna di bin biryar û gefên vê rêjîmê de ne.

Di dema dawî de,rêjîma Sûryayê biryar da ku karmendên li dezgeh û saziyên dewletê kar dikin biçin xula xweberevaniyê,ji bo ew fêrî şer û rahiştina çekan bibin û çi kesê ku bi vê biryarê pabend nebe wê mûçeya wî were rawestandin û dibe ku ji kar were dûrxistin,vê yekê metirsiyeke mezin li cem karmendan peyda kir.

Dilşad xalid li ser vê mijarê ji kovara welat re wiha axivî :" ji ber ku min leşkeriya rêjîmê nekiriye,min newêrîbû ku ez biçim wê xula xweberevaniyê ya rêjîmê û di encamê de biryara rawestandina mûçeya min û gelek karmendên din derket".

Hin karmendên ku temenê wan mezin bû û hew çend sal mane ku karmendiya xwe li ba dewletê bi dawî bikin û bigihin xanenişîniyê,pabendî bi wê biryarê kirin,lê dîsa ew jî xilas nebûn.

Ziyad Mehmûd ji kovara welat re got:"Em ji tirsa rawestandina mûçeyan,tevlî wê xuleyê bûn,lê piştî me ew rahênan bidawî kirin,ji me re gotin divê hûn biçin ser rêbendan û li ber deriyên navendên ewlekariyê ên bi ser rêjîmê ve nobedariyê bikin,em nema zanin çibikin?".

Ev rewş di demekê de tê ku karmendên dewletê azarkêşiya herî mezin ji rewşa buhabûnê dikşînin,ji ber piraniya bazirgan û karmendên din li gor ketina lîreya sûrî karên xwe serast dikin,lê mûçeyên karmendan weke xwe ne ku îdî debara jiyanê bi wê mehanê dijwar û zehmet e.

Hemîd Elî jî dibêje: Piştî biryara rawestandina mûçeyên me derket,em nema dizanin çawa debara jiyana xwe bikin,çawa emê bikaribin pêdiviyên rojane ji malbata xwe re peyda bikin û em li benda çareseriyekê ne".

Ji aliyê xwe ve berpirsên rêveberiya xweser li kantona Cizîrê ragihandin ku rêjîm bi van kiryaran wê nikaribe fişarê li me û miletê me bike,û rêveberiyê bi zimanê berpirsên xwe got: Deriyê dezgeh û saziyên me ji karmendên ku mûçeyên wan hatiye rawestandin re vekiriye û emê bi her awayî hewl bidin ku em alîkariya wan bikin".



# Di rewşa şer de,Çalakiyên Rêxistinên sivîl

**Salar Salih**

Ji ber rewşa şer û lidarketina nakokiyan di civaka Sûrî bigiştî de,û bandorên wê li civaka bajarê Hesekê,rêxistinên civaka sivîl bi berdewamî çalakiyan lidardixin bi mebesta aktîvkirina danûstandinan û çareserkirina nakokiyan bi şêweyekî aştiyane,û di vê çarçoveyê de,herdû rêxistinên civaka sivîl,rêxistina Hevkar a geşepêdanê û rêxistina Aşna a ciwanan,semînarek lidarxistin,li ser têgeha civaka sivîl û armanc û erkên wê nemaze di rewşa şer û nakokiyan de.
Mafperwer Salar Salih semînar pêşkêşkir û têde têgeha civaka sivîl û bingehên wê,û rola rêxistinên sivîl di rewşa şer de şirovekir,û giringiya hebûna wan di civakê de,ji ber rola wan yan giring di pêşxistina civakê de û alîkariya desthilata demekî li ser şêweyên birêvebirina civakê,herweha amaje bi giringiya hevkariyê di navbera partiyên siyasî û rêxistinên civaka sivîl de zelal kir,û her aliyek ji wan bi rolek giring radibe di asta derbirînê li ser daxwazên civakê.
Ayaz endamê rêxistina Aşna a ciwanan ji kovara Welat re axivî: Mebesta me ji vê destpêşxeriya ku em têgeha civaka sivîl ji gêncên xwe re şirove bikin,û her tiştê pêwendîdar bi vê civakê re,herweha diyarkirina rola dezgehên civaka sivîl,çiku ev yek ji gelek gêncan re nediyar e,herweha gelek têgehên şaş di mejiyên wan de hatine çandin,rêxistina me Aşna gaveke bi aliyê xurtkirina rola ciwanan di civaka sivîl de,nemaze hîn ev civak di destpêkê de ye,û temenê wê ne zêdeyî pênc sala ne.
Emîra endama rêxistina Hevkar a geşepêdanê ji kovara Welat re li ser vê semînarê axivî û got: Min gelek mifa ji vê semînarê wergirt,bi taybet me pêkhateyên civaka sivîl naskir,û armanc û erkên dezgehên civaka sivîl,û ev xal ji me re pir giring e,wek em di hundirê saziyeke sivîl de kar dikin.
Herdû rêxistinên sivîl Hevkar û Aşna proşorek li ser mijara semînarê amadekirin û di destpêka semînarê de li ser beşdaran belavkirin,têde gelek mijarên giring şirovekirin li jêr van sernavan: Têgeha civaka sivîl,ramana hebûna civaka sivîl,pênasîna civaka sivîl,bingehên civaka sivîl,pêkhateyên civaka sivîl,erkên civaka sivîl,armancên civaka sivîl,bingeha zagonî bo damezirandina rêxistinên sivîl,bo çi ew dezgehên sivîl yên çalak pir giring in di civakên ku di bin bandora şer de jiyan dikin. ■





# çûn û hatin li Tirbespiyê

Yasmîn Hesen

Bajarokê Tirbespiyê li ser çemê cerihê avabûye,ev bajar dikevê rohilatî bajarê Qamişlo de,dûrbûna Tirbespiyê ji Qamişlo (25-30) km e,Tirbespî dikevê roavayî bajarokê çilaxa,Girkê Legê û Dêrikê de,ango em dikarin bêjin ku Tirbespî mîna xeleka gihandinê ye di navbera Qamişlo ji aliyekî ve û çilaxa,Girkê Legê û Dêrik ji aliyekî din ve.

Her wiha gelek gund li derdora Tirbespiyêhene,û ev gund tev çûn û hatina xelkê wan li Tirbespiyê ye,ji bo bazar,textor û seredanan....

Derbarî çûn u hatinê (ji - ta ) tirbespiyê em dikarin du parça bibînin

1- çûn û hatin di nava bajêr de: Tirbespî bi xwe bajarokekî ne pir mezin e,ji ber vê yekê piraniya welatiyên Dirbespiyê peyatî diçin û têne ser karê xwe,lê dema ku mirovek barek pêre hebe ew neçare otombêl yan jî matorekî du teker kirêbike,da ku herê taxa xwe yan devera ku ew dixwaze,ev otombêl û mator li navenda bazara Tirbespiyêradiwesti,ji bo ku her kesê bi wan hewce bê nêzîkî wan bê.

Çûn û hatina derveyî tirbespiyê: Ev jî du beşin: -2

A - çûn û hatina ji Tirbespiyê ta (Qamişlo - çilaxa
Girkê Legê û dêrikê): welatiyên Tibespiyê di çin û têne van bajarên navbûrî bi foks u servîsan,lê çûn u hatina Ji tibespiyê ta Qamişlo ji ya çilaxa,Girkê Legê û dêrikê xurtir e.

Ji ber ku piraniya karê welatiya li Qamişlo ye,mîna textor,bazar û seredan....

Foks û servîsên (Dêrik - Qamişlo) di Tirbespiyê re derbas dibin,gelek caran welatiyên dixwazin herin Qamişlo berê xwe didin foksê (Dêrik - Qamişlo),lê ajokerên foksên Tirbespiyê gilî dikin,dema ku foksê Dêrikê radijine siwaran ji Tirbespiyê ber bi Qamişlo ve.

çûn u hatina welatiyên Tirbespiyê ji bo (çilaxa – Girkê Legê - Dêrikê) ew jî bi foksan bi kar tê,û foksên Dêrikê dema ku ji Qamişlo vedigerin,ew radijine welatiyan ji Tirbespiyê ber bi çilaxa,Girkê Legê û Dêrikê ve.

B - çûn u hatina gundan:

wek me berî niha got bû,ku gelek gund hene li derdora bajarokê Tirbespiyê bela dibin,her roj welatî bi hewceyî çûn u hatinê ne,hin ji van gundan li ser rêzekêne,ji ber vê yekê foks û servîs ji bo çûn û hatina wan têne bikaranîn,mîna gundên başûrê Tirbespiyê,ku foksên wan li cihekî nîşankirî têne dîtin, mîna gundê (Ebû feri ‘ - um i’zam û hedad),û gundin hene ku li ser riya Qamişlo yan Dêrikê ne,û mirov dikare bi foksê wan bajarê navbûrî bigihe wan gunda,mîna gundê ( digir - hilwa - beyandûr – tenurî û e’tşan) ....

(
û gundin hene ne li ser riya tu bajarane,lê fox yan jî basek taybet bi wî gundî heye,ku ew foks ji devereke nîşankirî li tirbespiyê derdikevê,mîna gundê (Dêrûna Qulinga-E’marat û Mizgeft),û hin ji gundên derdora Tirbespiyê kune li ser tu riyane,nejî wesayiteke
taybet bi gund heye,dema ku mirov bixwazê herê wan gundan yan jî ji wan were,ew neçare ku otombêlek yan jî matorekî du teker kirê bike,yan jî peyatî bidê ser riya gund,yan jî li benda wesayitekê ji gund bimînê mîna (Til Berhem - Hasud – Girdêm yê jor). ko

Hêjayî gotinê ye ku rêveberiya trafîkê li Tirbespiyê dest bi tomarkirina otombêl û matoran kiriye,û nemre bi navê “Tirbespiyê” ye.

Eve rewşa çûn û hatinê li bajarokê Tirbespiyê,lê em nizanin bê rojên tên derbarî çûn û hatinê li Tirbespiyê û derdora wê çi ji me re veşartine,gelo wê guhertin di vê rewşê de çêbibin yan na??!!

# الشيخ مقصود، ويلات ونزوح.


آيندا كوران

الشيخ مقصود هو حيّ شعبي يقع في مدينة حلب شمالي سوريا، وغالبية سكّانه من الأكراد الذين انتقلوا من قرى مدينة عفرين وكوباني ليتّخذوا من هذا الحيّ المتواضع مسكناً لهم، للشيخ مقصود أهمية استراتيجيّة مهمّة نظراً لموقعها المطلّ على القسم الشمالي الغربي من مركز محافظة حلب، و ينقسم هذا الحي إلى قسمين: الشرقي و الغربي و قسم ثالث عشوائي يسمّى معروف نسبة إلى مسجد معروف الذي يقع في الحي، كما أنّ هناك منطقة أخرى قريبة من الشيخ مقصود تسمى بحقل الرمي و الذي كانت تعقد فيه احتفالات النوروز قبل الحرب السورية.

كان يقطن الحي ما يقارب 300 ألف نسمة، و لكن منذ بداية الحرب السورية تقلص عدد قاطنيها إلى الثلث و ذلك بسبب الهجرة و النزوح الذي حدث بالإضافة لمقتل المئات من أهالي الحي نتيجة القصف و الاشتباكات. الشيخ مقصود، ذلك الحي الذي كان بمثابة بيتٍ يجمع فيه عائلته التي تشتّت شملها الآن و تفرّق ناسها، أطفالها قتلوا و شرّدوا فقط لأنهم رفضوا أن يشاركوا في هذه الحرب اللعينة. تحوّل الحيّ إلى حلبة للصراع بين جميع الأطراف، فالنظام يرغب به لصالحه و المعارضة تريده لها، و هدف الطرفين واحد و هو السيطرة على هذه التلّة العالية و التي تطلّ على أغلب محافظة حلب نظراً لوقوعها على أرضٍ مرتفعة تسمّى جبل السيدة. منذ بداية الحرب السورية، حاول أهالي الحيّ جاهدين الحفاظ على حيّهم وعدم السماح لأحدٍ المسّ بأمنها و أمانها و بالفعل كان لهم ما يريدون، تمكّنوا من حماية أهلهم و ممتلكاتهم لفترة من الزمن و لكن بتاريخ 29 / 3 / 2014 حيكت مؤامرة كبرى ضدّ الحيّ المذكور، هاجمتها بعض الجماعات المسلّحة بحجّة أنّها فقط تبحث عن بعض المطلوبين و سوف تخرج من الحيّ بمجرّد القبض عليهم، لكن و بعد أن دخلت الحيّ في تمام الساعة الثالثة فجراً بدأت تطلق شعارات الله أكبر أخذنا الشيخ مقصود. قاطنو الحي إستفاقوا في تلك الليلة على أصوات دبّت الرعب و الذعر في قلوبهم. من هنا بدأت المعاناة و بدأ التهجير و النزوح من الحي باتجاه قرى عفرين، عانى الكثير من أهالي الحي من صعوبة توفير مسكنٍ لهم في عفرين، فاضطرّوا للعودة إلى الحيّ و العيش تحت رعب الطائرات الحربيّة و القذائف التي تنهال على الحيّ من كل حدبٍ و صوب، منازل الحي تحوّلت إلى أوكارٍ يختبئ فيها اللصوص، لقد سرقوا الحي و نهبوه، دمّروا أحلام طفولتنا و حرقوها، تلك مدارس علمنا تحوّلت لثكناتٍ عسكريّة، أيّ حربٍ لعينةٍ هذه التي تسمح أن يتحوّل بيت العلم إلى مكانٍ للسلاح و القتل. وحدات حماية الشعب و المرأة الكورديّة تمكنت و بعزيمة شبّانها و شابّاتها من إعادة السيطرة على الحيّ و طرد كل المجموعات منها و منذ ذلك الوقت و الحيّ يتعرّض لقصف هيستيريّ من تلك الجماعات الراغبة ببسط سيطرتها على الحي.

2016 / 2 /4 بدأ القصف العشوائيّ على الحي، قصفٌ يعتبر الأعنف من نوعه، استهدف الإنسان و الجماد و النبات في كلّ جزءٍ من الحيّ، صراخ الأطفال و عويل الأمّهات ونداءات الآباء تملأ أرجاء الحي، أصواتٌ مملوءةٌ بالخوف و الذعر، أنقذوا الشيخ مقصود، أنقذوا أطفالنا، أنقذوا حياتنا، نحن نقتل، و لكن ما من مجيب، ثمّ كأنّ ما تسبّبوا به من قتلٍ و دمارٍ في الحي لم يشفِ غليلهم، حتى لجؤوا لاستخدام أسلحة تحمل مواداً سامّةً تودي بحياة كل من يستنشق رائحتها و تتسبّب بتسمّمه. السؤال الذي أطرحه هنا هل كتب على الكورد أن تتكرّر معهم مأسي ما حدث من مجازر في حلبجة بالقصف الكيماوي؟ هل سيسجّل التاريخ مجازر حي الشيخ مقصود أم ستذهب في مهبّ النسيان دون أيّ اهتمامٍ من الأطراف الدوليّة؟ إلى كلّ من سيقرأ كتابي هذا، نحن كورد الشيخ مقصود، قتلونا، شرّدونا، دمّروا فينا أحلام الطفولة، وحطّموا مقاعد دراستنا، أصبحنا لاجئين في بلادنا، رائحة الموت ملأت منازلنا المدمّرة، فهل سيذكر التاريخ و تذكرون الشيخ مقصود. ■





# البيلة الدموية.

## د.فهد محمود الحسين.

**تعريف:** وجود غير طبيعي لعدد من كريات الدم الحمراء في البول.

أنواعها: أ- عيانية: - مستمرة – متقطعة – نوبية ب- مجهرية.

لون البول لا يعبر دائماً عن وجود بيلة دموية, فبعض الأطعمة مثل: الشوندر, الجزر, الملونات الداخلة في صباغة بعض الأدوية مثل: (الفينازوبريدين, فينيديون, الفينوتيازينات, الفينولفتالئين) يمكن أن تغير لون البول.

وكذلك البيلة الخضابية وبيلة الميوغلوبين تسبب تغير في لون البول.

- يعتمد تشخيص البيلة الدموية على تعداد الكريات الحمراء الموجودة عينة منتصف البول.

يعد وجود أكثر من (٣) كريات حمراء في الساحة عالية التكبير أمر غير طبيعي.

لا يعتمد فحص البول والراسب عند النساء إلا بعد مضي خمسة أيام على انتهاء الدورة الطمثية, هناك أيضاً البيلة الدموية الصبغية (مفتعلة) والتي يضيف المريض إلى الدم عينة البول عمداً.

أسباب البيلة الدموية:

1- أمراض خارج كلوية بشكل ٦٥٪: a – تنشؤات السبيل البولي١٥-٢٠٪.

b- ضخامة البروستات الحميدة.

C- الحصيات البولية ٢٠٪.

d- الانتانات الحادة (التهاب المثانة, الاحليل, البروستات) ٢٠٪-٢٥٪.

e- الأدوية – مضادات تخثر – سيكلوفوساميد.

الأمراض الكلوية الكبية: ٣٥٪, بيلة دموية من منشأ كبي تحدث في أي عمر وأكثر شيوعاً عند الأطفال واليفعان الشباب.

A – تكاثرية: وتقسم إلى: a- بدئية: ١- اعتلال الكلية ب IGA أو (داء بيرغر).

2- التهاب الكبب والكلية التالي للمكورات العقدية.

3- التهاب الكبب والكلية منمي غشائي.

4- التهاب الكبب والكلية ليفي.

B- ثانوية: ١- التهاب كبب تالي للانتانات.

٢- فرفرية هينوخ شهرنلاين.

٣- الذئبة الحمامية الجهازية.

٤- متلازمة غود باستر.

5- التهاب الاوعية.

6- داء الغلوبولينات القرية الاساسي المختلط.

b- لا تكاثرية: ١- التهاب الكبب والكلية الغشائي.

٢- التهاب الكبب القطعي البؤري.

٣- تصلب الكبب السكري.

c- الأمراض العائلية: ١- متلازمة البورت (اضطراب وراثي يوجد عند الذكور أكثر بيلة دموية معزولة مع بيلة بروتينية وفقد سمع في السنوات المتأخرة من العمر).

٢- اعتلال الكلية الغشائي القاعدي الرقيق "بيلة دموية سلمية معاودة".

الأسباب الكلوية البارنشيمية غير الكبية للبيلة الدموية:

- التنشؤات – كارسينوما الخلية ( الكلوية – ورم ويلز- الكيسات السلية).
- أسباب استقلابية – فرط كلس البول – فرط حمض البول).
- وعائية: احتشاء الكلية- خثارات الوريد الكلوي- تشوهات وريدية – تنخر الحليمي – متلازمة البيلة الدموية والألم القطني (تحدث عند النساء).
- أسباب عائلية: داء الكلية العديدة الكيسيات – الكلية اسفنجية اللب.
- أسباب دوائية: مضادات التخثر – التهاب الكلية الخلالي الحاد الممرض بالأدوية.
- التنخر الحليمي: فرط استعمال المسكنات - داء منجلي وخلة الداء المنجلي – سل الكلية – السكري.

**الرضوض:** أسباب ثانوية: ١- نقص عوامل واستعمال مضادات التخثر.

٢- التمارين الرياضية الشاقة.

التقييم السريري: القصة المرضية والفحص السريري أساسيان.

إذا كانت البيلة الدموية في بداية البول فأنها توجه نحو أذية احليلية, وإذا كانت انتهائية فأنها تشيرإلى مرض ثانوي, وإذا كانت شاملة ,توجه نحو منشأ كلوي أو حالبي أو مثاني منتشر.

التشخيص: تحليل وزرع البول- إيكو بطن – وصور بسيطة للجهاز البولي ويمكن اجراء طبقي محوري للبطن للحالات المشابهة.

- تنظير المثانة هام لتشخيص العلاج.

توزع مجـــاناً

# Li Hesekê

## bijşîk koç dikin û derman nema peyda dibin!





welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya



Welat
ولات: مجلة شهرية ثقافية عامة
العدد (٢٩) ٢٠١٦/٥/١٥